City University London | Refugee Studies Centre | Paul Hamlyn Foundation

Young Undocumented Migrants in Britain

'Ciwanên Koçber ên Bêbelgekirî' projeyek e ku ji aliyê desteyeke lêkolînê ve li jêr serokatiya Dr. Alice Bloch (Zanîngeha City, Beşa Civaknasî) û Profesor Roger Zetter (Zanîngeha Oxfordê, Navenda Lêkolînên li ser Penaberan) ve tê bi rê ve birin ku ji aliyê Weqfa Paul Hamlyn ve hatiye peywirdar kirin da ku jiyan û debarkirina ciwanên koçber ên bêbelgekirî li gor têgihîştina wan vekole û fêm bike.

Ev desteya lêkolînê dê digel çendîn rêxistinan hevkariyê bike ku li ser ciwanên koçber ên bêbelgekirî kar dikin û her weha digel Beşa Evelyn Oldfield ku hevkarê şêwirmend e. Ev hevkarî gelek girîng e him ji bo bi ser ketina projeyê û him jî ji bo ava kirina zerengiyeke bilindtir û têkildarkirina mebestan ku derfetê bide rêxistinan ku bikaribin bi ciwanên koçber ên bêbelgekirî re bi awayekî bandordar kar bikin. Ev jî yek ji girîntirîn hêmanên Bernameya Dad a Civakî ya Weqfa Paul Hamlyn e ku par hatibû dest pê kirin.

Lêkolîn dê li sê deveran pêk were- London, North West û Midland. Di vê lêkolînê de têgihîştineke herêmî girîng e da ku metropol, bajar û gund bigire nav xwe û ev yek dê derfetê bide ku di qadên cihê yên kargirtinê de li debarkirinê bikole.

Şêst hevdîtinên berfireh werin pêk anîn û bîst derbirîn werin berhev kirin ji ciwanên koçber ên bêbelgekirî. Mebesta vê lêkolînê ew e ku wêneya jiyana aborî û civakî ya li Brîtanya ya wan kesan bikşîne ku bi wan re hevdîtin hatiye kirin û her weha rewşa wan a bêbelgebûyîn bandoreke çawa dike li ser jiyan û hilbijartinên wan. Lêkolîn, ciwanên koçber ên bêbelgekirî yên ji Zîmbabwe, Brazîlya, Çîn, Tirkiye (koçberên Kurd jî tê de) û Ukrayna digire nav xwe. Ev pênc welat ku koçber jê tên derfetê bide ku bi koçberên nûhatî û ên ku pêşiya wan hatî re hevdîtin pêk were ku bi vî awayî di domahiya demê de serpêhatinên ciwanan çawa teşe digirin û hilbijartinên wan çawa tên kirin, bi awayekî çêtir were fêm kirin.

Ev lêkolîn li ser berfirehkirineke serketî hatiye ava kirin (Nîsan- Tîrmeh 2007) **[giredan]** ku hevdîtinên komên armancgirtî pêk aniye digel takekes û rêxistinên ku bi ciwanên koçber ên bêblegekirî re têkildar in. Komên ku hatine armanc girtin di warê rewşa wan a bêblgebûyînê de pêdiviya fêm kirina tevliheviya pêvajoya jiyan, biryar dan û hilbijartinên ciwanên koçber ên bêbelgekirî destnîşan kir. **[giredan ji encam]** Lewma, ev lêkolîn dê li ser dengê ciwanên koçber ên bêlgekirî kûr bibe ku gelek hindik tê zanîn û her weha li mijarên sereke yên jiyan û derbara wan bikole û pêş de bibe ku di nav wan de ev jî hene: serpêhatinên kargirtinê, têkiliyên civakî, beşdarbûna di jiyana civakî de, têkilî û berpirsiyariyên bo heval û malbatên wan ên li welatê ku jê tên; bêbelgebûyîn bandoreke çawa dike li ser jiyan û mebest û daxwazên wan ên demdirêj ên ciwanên koçber ên bêlgekirî.

Ji bo agahiya pirtir tika ye têkilî deynin bi:

Alice Bloch
Email: A.Bloch@city.ac.uk

Nando Sigona
Email: nando.sigona@rsc.ox.ac.uk

Richard King (PHF)
rking@phf.org.uk
Tel: 020 7227 3529

An jî Rûpela YUM serî dayîn : www.staff.city.ac.uk/yum